Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 8 Nîsan 2023

International Journal of Kurdiname
Issue: 8 April 2023

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN-**2687-5438

# MELA YASÎNÊ ALIKÎ JÎYAN Û BERHEMÊN WÎ*
MOLLA YASİN-İ ALIKÎ'NİN HAYATI VE ESERLERİ
MELA YASIN ALIKÎ'S LIFE AND WORKS

Seher KARAK**

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 31.03.2023
**Accepted // Pejirandin:** 18.04.2023
**Published // Weşandin:** 29.04.2023
**Pages // Rûpel:** 79-109
**DOI:** DOI: 10.55106/kurdiname.1274933

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Karak, Seher, (2023). Mela Yasînê Alikî Jîyan û Berhemên Wî, *Kurdiname*, 8, p. 79-109

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

## Kurte

Mela Yasînê Alikî alim û edîbekî sedsala 20em e. Heta niha di edebîyata Kurdî de navê wî nehatiye bihîstin û neketiye nav lîteratura Kurdî. Mela Yasînê Alikî di sala 1891/1901? ê de hatiye dinyayê û di sala 1976an de li Panosê wefat kiriye. Mela Yasînê Alikî ji eşîra Alikî ye û kurê pismamê Feqe Reşîdê Alikî ye. Alikan eşîreke koçer e û malbata Mela Yasîn û Feqe Reşîd di salên salên 1882yan de ji derdora Cizîrê koçî Wanê kirine û ji Wanê jî koçî Panosa Agirîyê kirine.

Mela Yasîn bi ilmê re bilîyaye û li gundên Agirî û Wanê melatî û muderisî kiriye. Mela Yasînê Alikî li dû xwe çend helbest û Cengnameyeke Hz. Elî (k.v.) ya bi navê "Ġezwetu Huneyn"ê hiştiye. Me piranîya helbestên wî bi rêya bandên teyîbê bi dest xist û Cengnameya wî jî weke sê nusxeyên destxet li ber dest e.

Cengnameya Alikî di qada xwe de cengnameyeke xweser e, lewra dema em li edebîyata Kurdî (Kurmanci) ya klasîk mêze dikin tê dîtin ku berhemên di cûreya cengnameyê de kêm in. Cengnameya Alikî li ser herba Huneynê ye û li gor daneyên li ber dest di edebîyata Kurdi (Kurmancî) de li ser vê herbê bi awayê menzûm berhemên serbixwe nayên dîtin. Ji ber vê yekê ev berhema Alikî di qada xwe de gelekî girîng e. Bi saya berhemên wî em hay ji alîyê wî yê edebî jî çê dibin. Di vê xebatê de em dê li ser jîyan, kesayetîya wî edebî, aîdîyeta "Ġezwetu Huneyn"ê û li ser berhemên Mela Yasînê Alikî rawestin û wan bidin naskirin.

**Peyvên Sereke:** Mela Yasînê Alikî, Cengname, Ġezwetu Huneyn, Eşîra Alikî, Panos.

## Özet

Molla Yasin-i Alıki 20. yy. âlim ve ediplerindendir. Şu ana kadar Kürt edebiyatında ismi duyulmamış ve literatürde yer almamış bir ediptir. Molla Yasin-i Alıki 1891/1901? yılında doğmuş ve 1976 yılında Patnos'ta vefat etmiştir. Molla Yasin-i Alıki, Alikan aşiretine mensup olup Feqe Reşîdê Alikî ile çok yakın akrabadır. Alikan aşireti göçebe bir aşiret olup söz konusu aile 1882 yıllarında Cizre'den Van'a oradan da Ağrı'nın Patnos ilçesine göç etmişlerdir.

Molla Yasin-i Alıki ilimle iştigal etmiş ve Ağrı ile Van'ın çeşitli köylerinde imamlık ve müderrislik yapmıştır. Mela Yasînê Aliki Kürtçe birkaç şiir ile "Ġezwetu Huneyn" adında bir Hz. Eli Cengnamesini Kürt edebiyatına kazandırmıştır. Şiirlerinin çoğu kaset kayıtlarından elde edilip cengnamesi de üç elyazma nüsha olarak mevcuttur.

* Ev xebat pişta xwe dide teza bi navê Cengnameyeke Hezretî Elî: "Ġezwetu Huneyn " a Mela Yasînê Alikî (Metin û Lêkolîn), Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn, 2022.
** Turkey, seherbisar@gmail.com, Orcid: 0000-0001-9873-4456.

Aliki'nin bu cengnamesi klasik Kürt (Kurmanc) edebiyatında örneğine az rastlanılan bir türdür. Bu cengnamesi Hüneyn Savaşı üzerine olup mevcut bilgilere göre Kürt (Kurmanc) edebiyatında bu konuda manzum ve müstakil bir eser görülmemektedir. Bu açıdan Aliki'nin bu eseri kendi alanında önemlidir. Molla Yasin-i Alıki'nin bu eserleri sayesinde onun edebi yönü ortaya çıkmaktadır. Bu çalışmada Molla Yasin-i Alıki'nin hayatı, edebi yönü, eserleri ve "Ġezwetu Huneyn" adlı eserinin aidiyeti üzerine durulup eserleri tanıtılacaktır.

**Anahtar Kelimeler:** Molla Yasin-i Alıki, Cengname, Ġezwetu Huneyn, Alıki Aşireti, Patnos.

## Abstract

Mela Yasîn Aliki is a poet and writer of the 20th century. Until now, his name has not been heard in Kurdish literature and has not been included in Kurdish literature. Mela Yasînê Alikis year of birth is not known exactly. There are two opinions about that they are 1891 and 1901. He died in 1976 in Patnos. Mela Yasînê Alikî is a member of the Alikan tribe and he is from Feqe Reşidê Alikî family. The Alikan tribe is a nomadic tribe and the family in question migrated from Cizre to Van and from there to Ağrı Patnos in 1882.

Mela Yasîn was engaged in science and worked as an imam and professor in various villages of Ağrı and Van. Mela Yasînê Alikî, wrote few poems in Kurdish, and with them he brought Hz.Eli's cengname to kurdish literature which named "Ġezwetu Hunayn". Most of his poems are obtained from cassette records and his Hz. Ali's Cengname is available in three manuscripts. This cengname of Aliki is a rare genre in the classical Kurmanc literature. This text is about the Battle of Hunayn, and according to the available information, there is no verse and detached work on this subject in Kurmanc literature. In this respect, this work of Aliki is important in its field. Thanks to these works of Mela Yasînê Aliki, his literary side is revealed. In this study, the life, literary direction and works of Mela Yasînê Alikî will be introduced.

**Keywords:** Mela Yasînê Alikî, Cengname, Ġezwetu Huneyn, Alikî Tribe, Patnos.

## 1. DESTPÊK

Edebîyata Kurdî ya klasîk piştî dawîlêhatina mîrektîyên Kurdan ketiye bin bandora medrese û tekyayên Qadirî û Neqşebendîyê. Bi taybetî di bin banê terîqeta Neqşebendîya Xalidîtîyê de gelek helbestvan, alim û muderîs derketine holê û van kesan li dû xwe gelek berhemên edebî, dînî, civakî û hwd hiştine. Ebdilqadirê Hezanî, Mihemed Can Aqtepî (Xakî), Mistefayê Sîsî, Ebdurrehmanê Aqtepî (Rûhî), Selîmê Hîzanî, Mihemed Emîn (Melayê Mezin), Mihemedê Aqtepî (Kerbelayî), Mehmûdê Zoqeydî, Seyîd Elîyê Findikî, Melayê Xasî, Seydayê Licî û Şêx Muşerrefê Perwarî hin ji van kesan in (Adak, 2017: 59-64; Karak, 2020: 15-17). Nivîskarê me Mela Yasînê Alikî jî di atmosfereke weha de perwerde bûye û wî jî bi vê kevneşopîyê helbest û berhemeke dînî-edebî nivîsîye.

Cengname ji du bêjeyan muteşekîl e. "Ceng" tê wateya herb, şer û lihevxistinê, "name" jî tê wateya nivîs û pirtûkçeyê. Cengname jî ew pirtûk û berhemên ku mijara wan çîrokên şer in (Develioğlu, 2017: 150). Li gorî Jean-Louis Mattei jî cengname ew cûreya edebî ye ku bi awayekî mibalexe û mucîzewî behsa rûdanên ku dê bi ti awayî neqewimin dikin. Herweha li gor Mattei mijara cengnameyan ew hedîse ne ku di navbera misilman, xiristîyan û kesên ku bawerî bi dîn neanîne derbas dibin. Rûdanên cengnameyan bi piranî li derdora Hz. Elî (k.v.), Hz. Muhemmed (s.x.l.), eshabî û kesên ku ji alîyê nivîskarê berhemê ve hatine afirandin, derbas dibin. Cengname ew berhem in ku rûdanên tarîxî di xeyalên muelîfan de dirûv girtine û çêkirî ne. Loma cengname ne weke rûdanên tarîxî rastîn in (J. L. Mattei, 2004: 18).

Di cengnameyan de em li alîyekî bûyereke rastîn dibînin ku di serdemêkê de pêk hatiye û li alîyekî din jî hin bûyerên çêkirî hene ku ji ber xeyal û fikrên nivîskar derketine holê. Em di cengnameyan de rastî lehengên nemir, xwedî hêzên derasayî, hût, dêw, şêr û cadûyan tên. Her çiqas cengname jî perçeyeke ji berhemên dîrokî bin jî ji ber ku di xwe de bûyerên çêkirî û derasayî vedihewînin ji rastîyê dûr dikevin.

Li gor agahîyên li ber dest di edebîyata Kurdîya Kurmancî de “Borê Qer” (Qewlê Hespê Reş) û “Qewlê Newala Sîsebanê” weke berhemên menzûm ên cûreya cengnameyê di nav nimûneyên pêşîn ên nivîskî de xuya dibin.[1] Herweha berhema Mela Yasînê Alikî ya bi navê “Ġezwetu Huneynê” jî di vê qadê de berhemeke mustaqîl a menzûm e. “Ġezwetu Huneynê” di salên 1930yî de hatiye nivîsîn, yanî di ser nivîsîna wê re derdora 90 salî derbas bûye. Em ji hejmara nusxeyên wê fahm dikin ku li herêmeke biçûk ya weke Patnosê hay ji berhemê hebûye û jê hatiye hezkirin, lewra heta niha weke destxet em gihaştine sê nusxeyên wê. Her çiqas li heremeke lokal hatibe naskirin jî ji ber ku ev berhem piştî nivîsînê bi demeke kurt li ser xebatek nehatiye kirin û nebûye berhemeke çapkirî di qada edebîyata Kurdî de nehatiye naskirin. Herweha ji ber ku li ser şerê Huneynê bi awayekî menzûm di Kurmancî de berhemên mustaqîl derneketine holê ev berhema Alikî cîyekî girîng digire û giranbuha ye.

Mela Yasînê Alikî alim, muderîs û edîbekî sedsala 20em e. Lê heta niha di qada edebîyatê de nehatiye nasîn û bihîstîn. Agahîyên derheqê Mela Yasîn de li ber destan kêm bûn û em bi awayekî teqez negihaştin hûrgulîyên jîyana wî. Ji bo amadekirina xebatê em bi keça wî Husna Atasevenê û bi çendîn nevî û nasên wî re ketin îrtîbatê. Bi saya hevdîtin û hevpeyvînên ku me bi nasên Mela Yasîn re kirin em gihaştin hin malûmatên jîyana Mela Yasînê Alikî.

Mela Yasînê Alikî li herêma Panosê hatiye nasîn û ji alîyê xelkê Panosê ve hatiye hezkirin. Heyata xwe li ser zanîn û ilmê borandiye û mala xwe ji bo talebeyên xwe weke mederese bi kar anîye. Di vê xebatê de em dê hewl bidin jîyana Mela Yasînê Alikî û berhemên wî bidin nasîn.

## 2. JÎYANA MELA YASÎNÊ ALIKÎ

### 2.1. Jidayîkbûn û Zarokatîya Wî

Malûmatên derbarê jîyana Mela Yasînê Alikî (Yasin Çelebi) de ne zêde ne (bnr. Pêvek: 1). Navê dîya wî Heyat (1897-?) û bavê wî Hecî Mela Ebdullah (1864-?)[2] bûye. Endamên malbata Mela Yasîn jî derheqê dîroka zayîna Mela Yasîn de ne xwedî agahîyên zelal bûn û ji ber vê hindê em ne gihaştin dîrokeke teqez. Lêbelê li ser dîroka çêbûna Mela Yasîn li ber destê me du dîrok hene. Li ser kêlên qebra Mela Yasîn tarîxa çêbûna wî weke 1317 (mîladî1901) hatiye nivîsîn (bnr. Pêvek: 2). Lêbelê di kutuka nufûsê ya malbatê de tê ditin ku bi awayekî fermî dîroka çêbûna wî weke 1891ê hatiye dayîn.

Li gorî Kutbettin Yılmaz[3] Mela Yasîn li gundê Zomika[4] çêbûye, lê ev agahî weke îhtîmal e û ne teqez e. Agahîyên derbarê heyama zarokatîya wî jî zêde nînin û li gorî Yılmaz wî

[1] Ji bo metnên her du berhemên navborî bnr.: (Celîl, 2004 & Demir, 2012).
[2] Mela Ebdullah di sala 1864an da li Erdîşa Wanê çêbûye û sala wefata wî nedîyar e.
[3] Kutbettin Yılmaz, nevîyê Feqe Reşîd e. Feqe Reşîd jî pismamê bavê Mela Yasînê Alikî ye. Kutbettin Yılmaz li heyatê ye û li Panosê dijî.
[4] Bi Tirkî ji vî gundî re “Yukarı Göçmez” tê gotin.

zarokatîya xwe li gundê Pîromerê[5] borandiye. Di heyama zarokatîya Mela Yasîn de ev gund bi Erdîşa Wanê ve girêdayî bûye (K. Yılmaz, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021).

Seyda Mela Yasînê Alikî piştî emrekî ku di nav ilm û zanînînê de derbas kiriye di 1976an de li Panosa Agirîyê koça dawî kiriye û li Panosê medfûn e.

**2.2. Nav û Mexlesa Wî**

Mela Yasîn di nav gel de weke Seyda Mela Yasîn hatiye nasîn, lê di fermîyetê de navê wî "Yasin Çelebi" ye. Herweha ji ber ku çûye Hecê jî jê re Hecî Mela Yasîn jî hatiye gotin. Mela Yasîn di cengnameya xwe ya bi navê "Ġezwetu Huneyn" de xwe weke Yasînê Alikî daye nasîn. Herweha feqîyê wî Muhemmed Emîn di dawîya nusxeya "Ġezwetu Huneyn"ê de ku wî îstînsax kiriye Mela Yasîn weha daye nasîn: "Yasîn bîn Mola Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el-Neqşî" (bnr. Pêvek: 4). Em ji vê nivîsê têdigihîjin ku Mela Yasîn ji eşîra Alikan e û herweha pêgirtîyê terîqeta Neqşebendîya Xalidîyê ye. Mela Yasîn hem di helbestên xwe de hem jî di "Ġezwetu Huneyn"a xwe de navê xwe weke mexles bi kar anîye. Ji berhemên wî çend nimûneyên mexlesê:

*Navê Ellah xweş şêrîn e*
*Ew birînan dikewîne*
*Dibîne halê* ***Yasîn*** *e*
*Ahîn ku tê bîla 'eded*
…
*'E'urûnî be…. ullah*
*Ricaullah 'ibadullah*
*Ya Qutbellah ya Resulellah*
*Qelbê* ***Yasîn*** *tebarek kir*
(Bişaroğlu, 2022: 310-313)

*Eger Kurmancî mewzûn bû*
*We nîne bê hedîs ayat*
***Yasîn*** *perwanê narê bû*
*Beyan kir hal û ehwalat*
(Bişaroğlu, 2022: 219)

Mela Yasîn di "Ġezwetu Huneyn"a xwe de navê eşîra xwe jî ligel navê xwe weke mexles daye:

*Ya Ilahî umeta Ehmed*
*Temamen şa bikî*
*Hem digel wan da û baban*
*Hem* ***Yasînê Alikî***
(Bişaroğlu, 2022: 270)

**2.3. Zewaca Wî**

Mela Yasîn bi Hemîde (1901-1990)[6] Xanimê re zewicîye. Li gor Kutbbetin Yılmaz zewaca wan di navbera 1914 - 1920an de bûye (K. Yılmaz, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Ji vê zewacê heft zarokên Mela Yasîn çêbûne, çar jê kur û sê jî keç bûne. Navên zarokên wî: Mela

[5] Bi Tirkî jî ji vî gundî re "Pirömer" tê gotin.
[6] Li gor kevirê gora Hemîde Xanimê tarîxa çêbûn û wefata wê ev in: 1317-1989.

Ebdurehîm (1337/1918-1989), Mela Ebdulhekîm (1340/1921-1996), Mela Ebdulezîz (1930-2011), Mela Ebdulquddus (1931-1992), Husna (ç. 1933-), Mûmîne (ç. 1934-) û Esma (1940-1989) (H. Ataseven, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021).

### 2.4. Eşîra Mela Yasînê Alikî

Mela Yasîn ji eşîra Alikan e û wî ev agahî di cengnameya xwe de bi lêv kiriye. Li gor İsmail Beşikçi agahîyên ewil yên derheqê eşîra Alikan de di serdema Siltan Ebdulhemîd de bi avakirina alayên Hemîdîye bi dest dikevin. Li gor Beşikçi di wê serdemê de 36 Alayên Hemîdîyeyê hatine avakirin û her çiqas eşîra Alikan ne yek ji wan alayên ku di wê serdemê de hatibe avakirin jî di wê serdemê de di pevçûnên naveşîrî de ev eşîr roleke mezin lîstiye (Beşikçi, 2014: 109).

Eşîra Alikan ji qebîleyan pêk tê û navên qebîleyên vê eşîrê ev in: Cûdîgan, Çengoven, Ozîgan, Necîman, Mehman, Bêrîvan, Şehîdan û Şehevan (Beşikçi, 2014: 97).

Li gor Seyda Mela Omerê Dudêrî (Ömer Nas)[7] jî eşîra Alikan yek ji pênç eşîrên Çoqsorê yên Botanê ye. Alikan jî şaxeke vê eşîrê ye. Hemû şaxên wê ev in: Dudêra, Alikan, Mîran, Garisan û Soran. Ji van hemû eşîran re “pênc eşîrên Çoqsor ên koçer ên Botanê” tên gotin (Ö. Nas, Hevpeyvîn, Tebax 1, 2022).

Eşîra Alikan, eşîreke koçer bûye û debara xwe bi xwedîkirina heywanan kirine. Lewra ev eşîr havînan li zozanan û zivistanan jî li gundan bi cih bûne. Eşîra Alikan di demsala havînê de li derdora Gola Wanê û zivistanan jî li bajar û navçeyên weke: Farqîn, Batman, Bişêrîyê, Cizîrê, Xerzan û li Sêrtê bi cih bûne (Beşikçi, 2014: 82-85).

Mela Yasîn mensûbê eşîra Alikan e, wî ev yek di cengnameya xwe de jî bi lêv kiriye. Herweha di qismê temetê ya Nusxeya Mihemmed Emîn (NME) de jî navê eşîra wî bi zelalî weke Alikan hatiye îfadekirin (bnr. Pêvek: 4).

*Ya Ilahî umeta Ehmed*
*Temamen şa bikî*
*Hem digel wan da û baban*
*Hem* ***Yasînê Alikî***

(Bişaroğlu, 2022: 270)

Li gorî malûmatên ber dest Feqe Reşîdê Alikî pismamê bavê Mela Yasînê Alikî ye. Li gor Yılmaz jî Feqe Reşîd û Mela Yasîn ji eşîra Alikan in û ji qebîleya Codikan in û bi eslê xwe koçer in, koçerên Cizîra Botan in (K. Yılmaz, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Herweha Feqe Reşîdê Alikî jî di mehşernameya xwe ya bi navê *Sirru'l Mehşer*ê de ev agahî weha daye:

*Namê eşîra wî* **Alikan** *bû*
*Emma qebîle ji* **Codikan** *bû*

(Reşîd, 2020: 27)

Li gor vê agahîyê tê piştrastkirin ku Mela Yasîn jî ji eşîra Alikan e û ji qebîleya Codikan e.

[7] Seyda Mela Omerê Dudêrî yê Biçûk (ç.1960-) niha li Şirnexê weke mamosteyê Kursa Qur'anê dixebite.

## 2.5. Binemal û Şecereya Malbata Wî

Feqe Reşîdê Alikî ku pismamê bavê Mela Yasînê Alikî yê heq e, di *Sirru'l Mehşer*a xwe de weha behsa binemala xwe dike:

***Bavê wî 'Elî bû Ibnî Şe'ban***
*Eslê wî ji koçerên di Bohtan*

*Namê 'eşîra wî Alikan bû*
*Emma qebîle ji Codikan bû*


*Weqtê ji Bohtan îrtîhal kir*
*Qelbê wî li Zomikê meyal kir*
(Reşîd, 2020: 27)

Li gorî Kutbettin Yılmaz û Mela Nezif Katılmış[8] jî Mela Yasîn û Feqe Reşidê Alikî ji heman malbatê ne, malbata wan di 1882yan de ji Werîsa ku gundekî Cizîra Botan e koçî gundê Zomika ya Panosê kiriye. Ango bavê Feqe Reşîd û kalê Mela Yasîn, bi hev re koç kirine (K. Yılmaz, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Lêbelê li gor Seyda Mela Omerê Dudêrî gundekî bi navê Bîlwerîs di navbera çemê Botan û Beraşetê de hebûye. Gundê Bîlwerîs niha di bin çemê Bereşatê de maye û ev gund nêzîkî deh kîlometreyan ji bajarê Sêrtê dûr e. Mintiqeya gund girêdayî navenda Sêrtê ye (Ö. Nas, Hevpeyvîn, Tebax 1, 2022). Herweha mezrayeke bi navê Werîs (Gündoğan-Baltacık) jî mezraya gundê Serserê (Güngören) ye û ew jî bi ser Hîzana Bedlîsî ve ye. Li vê mezrayê koçerî tê kirin û li mintiqeya Hîşetê (Kolludere) ye ku di navbera Hîzan û Miksê de ye. Li gorî me ya maqûl gundê Werîs ku pêşîyên malbatê jê koç kirine dê gundê yê bi ser Sêrtê ve be, yanî gundê bi navê Bîlwerîs e û îhtîmale ku ev gund bi demê re weke Werîs jî hatibe naskirin.

Li gorî Yılmaz û Katılmış şeceya malbata Alikî bi vî şeklî ye; Mela Ebdullahê bavê Mela Yasîn kurê Îbrahîm e, Feqe Reşîd jî kurê Elî ye. Elî û Îbrahîm jî du kurên Şe'ban in û Şe'ban jî kurê Şiblî ye. Li gorî van agahîyên ku me ji her du kesên navborî wergirtin şecereyeke weha derdikeve:

[8] Nezif Katılmış (ç.1965) kurê Mela Huseynê Botîyê ku yek ji mustensîxê nusxeya cengnameya Mela Yasîn e û herweha Mela Nezîf nevîyê Kamilê kurê Feqe Reşîdê Alikî ye.


**Tablo 1: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî.**[9]




Ev şeceraya li jor li gorî Ebdullah Aytaç[10] ne ya rast e û li gorî neqla ku ji kurê birayê Feqe Reşîd ji Mela Tacdîn hatiye wergirtin divîyabû şecereya rast bi vî şeklî bûya: Se'îdê kalê Mela Yasîn û Îbrahîmê bavê Feqe Reşîd birayê hev in û her du kurê Şe'ban in. Şe'ban kurê Muhemmed e, Muhemmed kurê Îbrahîm e û Îbrahîm jî kurê Zeydî ye. Se'îd û Îbrahîm her du di fermîyetê de bi navê Elî derbas dibin. Ji ber vê yekê her du malbat jî navê kalê xwe weke Elî dizanin û ev tevlîhevî derdikeve holê (A. Aytaç, Hevpeyvîn, Tebax 1, 2021). Li gorî van agahîyan jî şecere weha ye:

[9] Ev şecereya malbata Mela Yasînê Alikî me ji neqla Mela Nezîf Katılmış û Kutbettin Yılmaz amade kiriye.
[10] Ebdullah Aytaç nevîyê birayê Feqe Reşîd e û niha li Stenbolê dijî.


**Tablo 2: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî[11]**




Herweha li gor agahîyên ku Abdulbarî Çelebiyê[12] birazîyê Mela Yasîn daye me binemala malbatê wisa ye: Qasim kurê Ebdulmutelîb e, Haşim kurê Qasim e, Mela Elî kurê Haşim e, Mela Ebdullah kurê Mela Elî ye û Mela Yasîn, Mela Tahir, Ebdurrehman, Ebdulkerîm û Ebdulmecît jî kurên Mela Ebdullah in (A. Çelebî, Hevpeyvîn, Tîrmeh 31, 2021). Li gorî van agahîyan şecereyeke wisa derdikeve:

[11] Ev şecereya binemala Mela Yasînê Alikî bi agahîyên Ebdullah Aytaç hatiye amadekirin.
[12] Ebdulbarî Çelebî kurê Ebdurrehman Çelebiyê birayê Mela Yasîn e.

**Tablo 3: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî.**[13]




Li gorî me jî şecereya ku Aytaç derxistiye ji yên din dirûsttir xuya dike. Lewra gava me bi her du malbatan re hevpeyvîn kir, malbatan navê kalê xwe weke Elî bi nav kirin. Di ewraqê fermî de ango di kutika malbata Mela Yasîn de jî navê kalê Mela Yasîn weke Elî derbas dibe (bnr. Pêvek: 6). Mela Ebdullah bavê Mela Yasîn e û pênc kurên Mela Ebdullah hebûne: Mela Yasîn, Mela Tahir Çelebi, Ebdurrehman Çelebi (w. 1992) Ebdulkerîm[14]û Ebdulhemîd (w. 2002).

## 2.6. Perwerde û Seydayên Wî

Zanîn û agahîyên derbarê xwendin û seydayên Mela Yasînê Alikî de kêm in û ne teqez in, çunkî malbat û kesên ku wî nas dikin di vî warî de ne xwedî malûmatên zelal in. Li gor agahîyên ku me ji malbata wî bi dest xistin Mela Yasînê Alikî di xwendingehên fermî de nexwendiye û wî tenê perwerdeya medreseyê standiye.

[13] Ev şecereya binemala Mela Yasînê Alikî ji ber agahîyên birazîyê wî Ebdulbari Çelebi hatiye amadekirin.
[14] Ebdulkerîmê kurê Mela Ebdullah di şerê di navbera malbata Mela Yasîn û Yusif Yaşar de hatiye kuştin.

Li gorî Kutbettin Yılmaz, Mela Yasînê Alikî heta ciwanîya xwe li ba Feqe Reşîdê Alikî[15] xwendiye. Paşê xwendina xwe ya dawî li ba Mela Zahirê Memanî (Tendûrekî-1882-1966)[16] kiriye û îcazeya xwe ya melatîyê jî ji wî wergirtiye (K. Uygar, Hevdîtin, Nîsan 4, 2020). Lêbelê dema em li îcazeya Hasan Tevfik Marulcuyê zavê Şêx Îsmaîlê Hezroyî (Çetin) mêze dikin li wir jî tê dîtin ku Mela Yasîn îcazeya xwe ya ilmê ji Mela Ehmedê Kurumzade[17] standiye (Bişaroğlu, 2022: 350-359). Li gor qeneata me jî dê Mela Yasîn îcazeya xwe ya ilmî ji Kurumzade wergirtibe. Çunkî agahîyên îcazeyên nivîskî ji yên devkî bi ewletir û mûtebertir in.

Li gorî Husna Atasevena keça Mela Yasînê Alikî û Mela Kutbettin Uygar jî Mela Yasîn ji bo xwendinê çûye Oxîn û Norşînê û di medreseyên li van deveran de perwerde bûye. Li gor Fesîh Yıldızê[18] nevîyê Mela Yasîn, ku ji dîya xwe neqil dike Mela Yasîn li ba Mela Qasim (Mela Qasimê Pozreş)[19] jî ders xwendiye (F. Yıldız, Hevpeyvîn, Tîrmeh 19, 2021). Herweha li gor Îsmaîl Çetîn, Mela Yasîn li ba Şêx Nesîmê Kufrewî[20] û Şêx Muhemmedê Erwasî[21] xwendiye û ji her duyan jî îcaze standiye (Çetin, 2020: 111). Herweha li gorî îcazeya Marulcu jî Mela Yasîn ji Şêx Nesîmê Kufrewî îcazeya tesewûfî wergirtiye (Bişaroğlu, 2020: 350-359). Şêx Îsmaîl Çetîn di berhema xwe ya bi Tirkî de weha behsa perwerde û xoceyên Mela Yasînê Alikî dike:

*Yasin Hâce değil, ya insan-ı kâmil*
*Yasin'in müfessiri olursa muâdil*

***İlm-i tasavvufu almış Şeyh Nesim ve Hâfid'den***
*Birinci Küfrevî'den, ikinci Gavs-ı Hizânî'den*

*Birleşir silsile Seyyid Tâhâ ile*
*İlmi birleşir Ahmed "Kürümzâde" ile*

*Meşhur aileden asıl Bitlisî*

---

[15] Feqe Reşîd di sala 1300/1883an de li herêma Botan, li der û dora Erûhê li gundê Werîs ji dayîk bûye. Navê bavê wî Şeban e, Şeban jî kurê Şiblî ye. Paşnavê wî yê fermî Yılmaz e. Heta niha berhemên wî yên bi navê "Sirrûl Mahşer" û "Cîhanşah" hatine weşandin. Feqe Reşîd di sala 1932yan de wefat kiriye û gora wî li gundê Pîromera Panosê ye.

[16] Mela Zahirê Tendurekî di sala 1882yan de li Milazgira Mûşê hatiye dinyayê. Navê wî Ebduzzahir e, navê bavê wî Nîmetullah e. Mela Zahirê Tendurekî li dû xwe dîwaneke ji helbestên klasîk bi zimanên cûda hiştiye. Di sala 1966an de li Milazgirê wefat kiriye û gora wî niha li gundê Tendûrekê ye (Tek, 2018: 83-108).

[17] Malumatên derheqê vî kesî de li ber destê me tune ne, lê em ji îcazeya Hasan Tevfik Marulcuyê zavê Şêx Îsmaîlê Hezroyî û ji agahîyên ku ji pirtûka Şêx Îsmaîlê Hezroyî derbas dibin em pê dizanin ku Mela Yasînê Alikî li cem Mela Ehmedê Kurumzade ders wergitiye û ji wî îcazeya ilmî standiye. Mela Ehmedê Kurumzade ji Bedlîsê ye. Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. (Çetin, 2020: 39-40)

[18] Fesîh Yıldız kurê Esma Yıldız e û Esma Yıldız jî keça Mela Yasîn e.

[19] Mela Qasim di sala 1879an de li Erdîşa wanê hatiye dinyayê û di sala 1967an de li Panosa Agirîyê wefat kiriye. Navê bavê wî Hemze û navê dîya wî jî Selwî bûye. Mela Qasim alim û muderisekî herêmê bûye. Di nav gel de weke Melayê Pozreş jî hatiye nasîn. (E. Yıldız, Hevpeyvîn, Tîrmeh 19, 2021).

[20] Şêx Nesîmê Kufrewî kurê mezin yê Şêx Ebdulbaqîyê Kufrewî ye. Perwerdeya xwe ya ilmî û tesewifî ji tekyaya Kufrewî wergirtiye. Postnişînê çarem yê tekyaya Kufrewî bûye û heta mirina xwe postnîşînîya tekyaya Kufreyê kiriye. Di sala 1950 de wefat kiriye û di nav tirbeya kalê xwe Şêx Muhemmed Kufrewî de hatiye veşartin (Kıran, 2021: 81-104).

[21] Şêx Muhemmed Hafîd nevîyê Seyîd Sibxatullahê Erwasî ye. Piştî ku bavê wî wefat kiriye, li cem xalê xwe Seyîd Nûr Muhemmed li Xeydayê maye. Li wir heta kitêba Camîyê xwendiye. Di sala 1957an de li Erdîşê li gundê Karamelikê wefat kiriye (Arvas Ailesi Mensupları Sosyal Yardımlaşma Dayanışma ve Kültür Derneği, http://arvasidernegi.com/biyografi_detay.aspx?biyog_id=45:Dema gihandinê 28. 03. 2023).

*Hâcesi Necmeddin Erciş yerlisi*

(Çetin, 2020: 39-40)

Li gorî agahîyên ku di îcazeya Hasan Tevfik Marulcu de mewcûd in Mela Yasînê Alikî zemanekî li ba Şêx Ebdulhekîmê Huseynîyê Bilwanisî[22] jî xwendiye (Bişaroğlu, 2022: 350-359).

Weke encam Mela Yasîn li ba kesên weke: Feqe Reşidê Alikî, Mela Zahirê Memanî, Mela Qasim, Şêx Nesîmê Kufrewî, Şêx Muhemmedê Erwasî, Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî û li cem Mela Ehmedê Kurumzade xwendiye. Herweha di şecereya Hasan Tevfik Marulcu de jî sîlsîleya perwerdeya ilmî ya Mela Yasînê Alikî bi berfirehî tê dîtin (Bişaroğlu, 2022: 350-359).

### 2.7. Melatî, Muderîstî û Talebeyên Wî

Mela Yasînê Alikî alimekî dewra xwe bûye, wî dersên weke mentiq, belaxat, îstîare, vadi’, adab, nîqaş, ilmên kelamê, fiqiha Şafî, tesewûf, Mînhac, Fethu’n-Nûnî, Eqaîda Nesefî, hedîs û tefsîrê dane (Çetin, 2020: 111).

Mela Yasînê Alikî bi karên weke melatî, miderisî û çandînîyê re bilîyaye. Mela Yasîn li çend gundên Wan û Agirîyê melatî kiriye, hin ji wan gundan gundên weke Şîwekar[23] Xirindas[24] û Hesendolî[25] ne. Li gor Uygar, Mela Yasîn li navenda Panosê jî miderisî kiriye.

Li gorî Nezif Katılmış, Mela Yasîn ji xeynî melatîyê bi çandinîyê re jî mijûl bûye, lê piştî ku şer û pevçûn di navbera malbata Mela Yasîn û Yusif Yaşar[26] de pêk hatiye ji gundê Kirakomê[27] koçî navenda Panosê kirine û Mela Yasîn li wir tenê melatî kiriye (M. N. Katılmış Hevdîtin, Hezîran 28, 2021).

Mela Yasîn li gundê Şîwekarê mala xwe weke medrese bi kar anîye û tê de talebe perwerde kirine (E. Erol, Hevpeyvîn, Tebax 8, 2021).[28] Li gor Husna Atasevenê gelek talebeyên Mela Yasîn hebûne (H. Ataseven, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Herweha li gor Katılmış û Yılmaz jî talebeyên Mela Yasîn hebûne û dersa Qur’an û Mewlûdê daye wan, lêbelê wî îcaze nedaye ti kesî (M. N. Katılmış & K. Yılmaz, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021).

Yek ji talebeyên wî yê navdar Şêx Îsmaîlê Hezroyî (Çetin)[29] ye. Li gor Hezroyî, Mela Yasîn di qada rîwayetkirina hedîsan, di ilmên weke felsefe, tesewûf û tefsîrê de serkeftî bûye. Hezroyî ji bo ustadê xwe Mela Yasîn dibêje; “Xoceyê ku herî zêde min ji ilmê wî fêde

---

[22] Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî (Huseynî) di sala 1902yan de li gundê Kermetê ku girêdayî navçeya Xana Hawêla Sêrtê ye hatiye dinyayê. Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî di sala 1972yan de li Kolika Semsûrê çûye rehmetê. (Yıldırım, 2018: 225).

[23] Bi Tirkî “Ovapınar” e. Girêdayî navçeya Miradîyeya Wanê ye. Li gor ku nevîyê Mela Yasîn, Ebdullah Akbaş neqil dikir Mela Yasîn li vî gundî jî miderisî kiriye (A. Akbaş, Hevpeyvîn, Îlon 14, 2021).

[24] Bi Tirkî “Meydandağı” ye. Ev gund girêdayî Erdîşa Wanê ye.

[25] Bi Tirkî “Hasandolu” ye. Bi navçeya Panosa Agirîyê ve girêdayî ye.

[26] Malbata Yusif Yaşar li gundê Kirakomê cînarê malbata Mela Yasîn bûne. Li ser erd di navbera her du malbatan de pevçûn çê bûye û di encama vê pevçûnê de ji her du malbatan jî kuştin çê bûye nusxeya NYYê ya “Ġezwetu Huneyn” ji malbata Yusif Yaşar gihaşt ber destê me.

[27] Bi Tirkî navê vî gundî “Eskikonak” e.

[28] Emrah Erol kurê Ebdurehîmê kurê Mela Yasîn e, niha li bajarê Aydinê dijî.

[29] Îsmaîl Çetin di sala 1942yan de li Hezroya navçeya Diyarbekirê hatiye dinê. Navê bavê wî Mehfûz e û navê kalê wî jî Mela Silêman e. Şêx Îsmaîl Çetin di sala 2011an de ji ber êşa Koahê li Ispartayê çûye rehmetê. (Ji bo agahîyên berfirehtir bnr; (Çetin, 2014: 5-6).

wergirtiye Mela Yasîn e”[30]. Herweha kesekî bi navê Muhemmed Yıldırım[31] jî ji Mela Yasînê Alikî ders wergirtiye. Li gor nevîyê Mela Yasîn, Ebdulwehap Çelebî[32] ku ji dîya xwe neqil kiriye “Seyîd Ebdulbaqî Erol, Seyîd Salih, Kemalê kurê Îbrahîmê Şewê, Seyîd Îzettîn û Feqe Mecîd” li ba Mela Yasîn ders xwendine (E. Çelebîyê, Hevpeyvîn, Îlon 13, 2021). Herweha ji nusxeya NME ku me li ba keça Mela Yasîn bi dest xist em dizanin ku şexsekî bi navê Muhemmed Emîn[33] jî li ba Mela Yasîn talebetî kiriye û jê ders standiye.

### 2.8. Terîqeta Wî

Mela Yasînê Alikî pêgirtîyê terîqeta Neqşebendîya Xalidî bûye, hevnasîna wî ya bi terîqetê re bi rêya medreseyan pêk hatiye. Çunkî Mela Yasîn di medreseyên terîqeta Neqşebendîyê de perwerde bûye. Hem li gor malûmatên ku Şêx Îsmaîlê Hezroyî dane û hem jî li gorî îcazeya Hasan Tevfik Marulcu em fêhm dikin ku Mela Yasînê Alikî perwerdeya tesewûfî wergirtiye (Çetin, 2020: 40/111; Bişaroğlu, 2022: 350-359). Mela Yasînê Alikî ji postnişînê dergaha Kufreyê ji Şêx Nesîmê Kufrewî û ji dergaha Xeydayê jî ji Şêx Muhemmedê Hafîdê Erwasî îcazeya xelîfetîyê wergirtiye (Bişaroğlu, 2022: 350-359).

Herweha feqîyê wî Muhemmed Emîn jî di dawîya nusxeya xwe de Mela Yasîn weha daye naskirin: “Yasîn bîn Mola Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el- Neqşî”. Em ji vê îbareyê jî fêhm dikin ku ew pêgirtîyê terîqeta Neqşebendîya Xalidî bûye.

## 3. BERHEMÊN MELA YASÎNÊ ALIKÎ

Li gorî Mela Kutbettin Uygar helbestên Mela Yasîn yên bi Kurdî hebûne û wî li ser civakê jî berhem dane. Mela Kutbettin bi xwe helbestên Mela Yasîn xwendine, lê hay ji serborîya wan helbestan nîne (K. Uygar, Hevdîtin, Nîsan 4, 2020). Herweha li gor Mela Nezif Katılmış û Kubettin Yılmaz berhemên Mela Yasîn hebin jî ew hay jê nînin. Demekê helbesteke şûxane bal Mela Yasîn ve hatiye nisbetkirin, lê ew jî ne teqez e (M. N. Katılmış & K. Yılmaz, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Li gor Husnaya keça Mela Yasîn jî gelek berhemên bavê wê hebûne, lê nizane çi bi wan bûne (H. Ataseven, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Heta niha em gihaştin 5 helbest û berhema wî ya bi navê “Ġezwetu Huneyn”ê û em dê li jêr behsa berhema wî û helbestên wî bikin.

### 3.1. Ġezwetu Huneynê (Cengnameya Hz. Elî)

Berhema Mela Yasîn ya bi navê “Ġezwetu Huneyn” (Cengnameya Hz. Elî k.v.) li ser Cenga Huneynê ye ku di dewra Hz. Muhemmed (s.x.l.) de di navbera misilman û qebîleyên Seqîfûn û Hewazînê de qewimîye radiweste. Ev berhema menzûm bi Kurdîya Kurmancî ye û bi cûreya cengnameyê hatiye nivîsîn.

[30] Ji bo agahîyên zêdetir bnr; (Çetin, 2020: 111).

[31] Mela Muhemmed Yıldırım di sala 1944an de li gundê Berdava ku girêdayî navçeya Dutaxa Agirîyê ye hatiye dinê. Li gor Muhemmed Yıldırım wî li cem Mela Qasimê Pozreş û li cem Mela Yasînê Alikî xwendiye. Yıldırım ji bo demeke kurt li cem Mela Yasîn dersên weke; *Şerhu'l-Muġnî* û *nehw*ê xwendiye. Mela Muhemmed Yıldırım niha li heyatê ye û melatîyekî teqawid e. (M. M. Yıldırım, Hevpeyvîn, Kanûna Paşîn 2, 2022).

[32] Ebdulwehab Çelebîyê kurê Ebudlezîzê kurê Mela Yasîn e.

[33] Agahîyên derheqê vî kesî de zêde li ber destê me tune ne. Li gor agahîyên ku me ji nusxeya ku wî îstînsax kiriye bi dest xistiye li gundê Şîwekarê li ba Mela Yasînê Alikî xwendîye. Navê wî Muhemmed Emîn e û navê bavê wî jî Xelîfe Hecî Ehmed e. Cengnameya Mela Yasînê Alikî ya bi navê “Ġezwetu Huneyn” îstînsax kiriye.

Cûreya vê berhemê di edebîyata Kurdîya Kurmancî de nimûneyên wê zêde nayên dîtin. Bi xisûsî jî li ser cenga Huneynê bi awayekî menzûm û musteqîl bi Kurmancî berhem nayên xuyakirin. Ev berhem di qada xwe de ji ber ku bi awayekî menzûm û xweser di edebîyata Kurdîya Kurmancî de hatiye nivîsîn xwedî cihekî girîng e.

Di nav vê cengnameyê de xezeleke 9 malikî jî ji alîyê muelîf ve di nav menzûmeyê de hatiye bicîkirin. Berhem bi tevahî ji 373 bendan pêk tê û bi kêşa birgeyî hatiye nivîsîn, lê ji serî heta dawî bi heman kêşa birgeyî nehatiye nivîsîn. Di metna vê cengnameyê de bi piranî kêşa 6, 7 û 8 kiteyî hatiye bikaranîn û di xezela di nav cengnameyê de kêşa erûzê hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê her beş ji alîyê kêş û serwabendîyê ve cûda ye. Du bendên ewil û yên dawî weha ne:

1. *Bibin guhdar ku ez bêjim*
*Beyan kim ez hikayatê*
*Ji xeman hûn bibin azad*
*Ku seh kin vê ‘ibaratê*

2. *Ji hicreta Resûlê Heq*
*Hezar sê sed ku derbaz bû*
*We pêncî sê bikin lahiq*
*Ji bo vê nezmê tarîx bû*

*372. Selewat bidin bira*
*Hûn xilas bin nîranê*
*Li Muhemmed aşkera*
*Şefî‘ roja mîzanê*

*373. Hem digel wî fatihe*
*Ji sehabiyê kiram*
*Bi ezmanek fesîhe*
*Ji umetê ra temam*

(Bişaroğlu, 2022: 306-309)

#### 3.1.1. Aîdîyeta Berhema “Ġezwetu Huneyn”ê

Heta niha sê nusxeyên destxet ên vê berhemê ji alîyê me ve hatiye tesbîtkirin. Her nusxeyeke vê berhemê li cîyekî cûda hat dîtin û li gorî van nusxeyan ji bo vê berhemê xwedîyên cûda jê re derdiketin. Ji ber vê yekê me hewceyî bi zelalkirina vê mijarê dît.

Di destpêkê de bi rêya Abdurrahman Adak em ji hebûna berhema bi navê Cengnameya Huneynê ango Ġezwetu Huneynê haydar bûn. Piştre em li ba Taha Halit Yaşar gihaştin nusxeyeke vê berhemê (Nusxeya Yusif Yaşar NYY). Li gor agahîyên ku me ji xwedîyê nusxeyê Taha Halit Yaşar bi dest xist ev berhem a kalê wî Yusif Yaşar bû. Li ser vê malûmata Halit Yaşar em bi malbata Yusif Yaşar re ketin pêwendîyê û me derbarê berhem û nivîskar de ji malbatê agahî berhev kirin. Paşê di encama lêkolînên ku me li ser berhemê pêk anîn, derket holê ku ev berhem ne ya Yusif Yaşar e û ya şexsekî bi navê Yasîn e. Gava me berhem veguhest ser tîpên latînî hin tehrîfat bi ber çavên me ketin. Di nusxeya NYYê de hat dîtin ku cihên mexlesa “Yasîn” lê hebû jê hatibûn birin û li dewsên navê “Yasîn” navê “Yusif” lê hatibûn

danîn. Piştî ku me qeneata xwe anî ev berhem a bi navê kesekî Yasîn e, em careke din ketin nav lêkolînê da ku em kesê bi navê Yasîn nas bikin. Piştî lêkolîneke dûvdirêj em gihaştin navê Mela Yasînê Alikî.

Li gorî malûmatên ku me ji malbatan wergirt zemanekî malbata Mela Yasîn û ya Yusif Yaşar cînarê hevdu bûne û piştre di navbera her du malbatan de hin hisûmet çêbûye û pev çînîne. Malbata Mela Yasînê Alikî di encama vê hisûmetê de koçî navenda Panosê kiriye. Hemû alav û malên xwe li pey xwe li gundê Kirakomê hiştine. Dibe ku ev berhema navborî jî li gundê Kirakomê mabe û bi vî şeklî ketibe destê malbata Yusif Yaşarî.

Di encama lêkolînê de ji bilî vê nusxeya sereke (NYY) em gihaştin du nusxeyên din jî. Nusxeya duyem Nusxeya Mihemmed Emîn (NME) li ba Husna Atasevena keça Mela Yasînê Alikî bû û nusxeya sêyem Nusxeya Mela Huseynê Botî (MHB) jî li ba Nezif Katılmışê nevîyê Feqe Reşîdê Alikî bû û li gorî malbata Feqe Reşîd muelîfê vê berhemê Feqe Reşîdê Alikî bû.

Di temeta nusxeya duyem (NME) ya berhema navborî de ji bo muelîfê wê Mela Yasînê Alikî hatiye nivîsîn û dîsa di heman nusxeya desxet de mexlesa “Yasîn” û “Yasînê Alikî” jî cî digirin.

Ahmet Gemî û M. Nezif Katılmış di xebatên xwe de ev berhema menzûm a bi navê “Ġezwetu Huneyn”ê di nav berhemên Feqe Reşîdê Alikî de di bin navê “Huneynîye” de dane nîşandan û ji bo berhemê gotine ev xezawetname berhemek ji berhemên Feqe Reşîdê Alikî ye û nêzî 1000 malikî ye (Reşid, 2020: 20). Her çiqas malbata Feqe Reşîdê Alikî jî îdia dike ku muelîfê “Ġezwetu Huneyn”ê Feqe Reşîd e, lêbelê di nusxeya sêyem (MHB) de ku mustensîxê wê Mela Huseynê Bohtî ye agahîyeke ku vê îdîayê piştrast bike nayê dîtin. Bi heman awayî ne di temeta nusxeya sêyem a destxet de ne jî di rûpelên nusxeyê yên ku li ber destên me ne, derheqê aîdîyeta ku muelîfê vê berhemê Feqe Reşîdê Alikî ye ti agahî nayê dîtin (bnr. Pêvek:5).

Gava em li her du berhemên çapkirî yên Feqe Reşîdê Alikî mêze dikin, bi awayekî aşkere di destxetên wan de tê dîtin ku Feqe Reşîdê Alikî weke muelîfê wan hatiye nivîsîn. Lêbelê di destxeta nusxeya MHBê ya “Ġezwetu Huneyn”ê de îbareyeke bi vî şeklî derbas nabe. Ev yek jî teza me ya ku ev berhem ne ya Feqe Reşîdê Alikî ye xurttir dike.

Gava em bi çavekî objektîf li ser her sê nusxeyên destxet hûr bûn û li gorî daneyên temetê û mexlesên di berhemê de, derket holê ku ev berhema navborî ya Mela Yasînê Alikî ye û ne ya kesên navborî ne. Lewra di nusxeya duyem (NME) de bi awayekî aşkere navê “Yasîn” hebû û di nusxeya yekem (NYY) de jî navê “Yasîn” jê hatibû birin û li cihê navê “Yasîn” navê “Yusif” lê hatibû zêdekirin. Yanî texrîbat di nusxeya destxet de pêk hatibû. Li gorî agahîyên ku em gihaştinê di nusxeya sêyem (MHB) de jî li şûna mexlesa “Yasîn” dîsa mîna vê texrîbatê navê “Reşîd” lê hatibû nivîsîn û navê “Yasîn” jî jê hatibû birin. Di temeta vê nusxeyê de jî ti agahîyek ku em bibêjin ev berhem ya Feqe Reşîd e tune bû û dîsa di vê nusxeyê de ji bo kurê Mela Yasînê Alikî jî îbareya “Ya Rebbî tu xelas ke Ebdulhekîmê Alikî” hatibû nivîsîn. Weke ku me li jor di şecereyê de behs kiribû Ebdulhekîmê Alikî yek ji kurên Mela Yasîn e. Li gorî van agahî û daneyan me biryar da ku “Ġezwetu Huneyn” a Mela Yasînê Alikî ye. Çunkî dane û delîlên li ber dest vê yekê bi awayekî zelal û aşkera didin nîşandan.

### 3.2. Helbestên Wî

Heta vê gavê ji bilî xezela ku di nav menzûmeya "Ġezwetu Huneyn"ê de ye em gihaştine çar helbestên Mela Yasînê Alikî. Me ji van helbestan sê helbest bi rêya banda teyîbê ku berî mirina Mela Yasîn hatibûn qeydkirin bidest xist. Li gorî Fesih Yıldızê nevîyê Mela yasîn ev her sê helbest ên Mela Yasînê Alikî ne. Banda ku ev helbest tê de ne di sala 1976an de hatiye tomarkirin (F. Yıldız, Hevpeyvîn, Tîrmeh 19, 2021). Di nav vê bandê de weaz, banga azanê, helbestên Mela Yasîn û helbesteke Şêx Eleddînê (w. 1969) kurê Şêx Ehmedê Xiznewî hene (Ji bo hemû helbestan bnr. Bişaroğlu, 2022: 306-314). Qismeke helbesteke Alikî jî me ji devê Mela Kutbettin Uygar girt û li vir dîyar kir. Bi vî awahî heta niha pênc helbestên Mela Yasînê Alikî ketin bin qeydê. Di van her pênc helbestên wî de jî em rastî mexlesa "Yasîn" tên.

Di helbestên Mela Yasînê Alikî de bi gelemperî jîyana takekesî, kesên terîqeta Neqşebendî û bawerîya bi Xwedê bi zelalî tê dîtin. Mela Yasîn di helbesteke xwe de behsa şikestina lingê xwe dike. Li gor nevîyê wî Fesih Yıldız gava ku Mela Yasîn ji bo azana sibehê diçe ser minareya mizgeftê ji wir dikeve û lingê xwe dişkîne (F. Yıldız, Hevpeyvîn, Tîrmeh 19, 2021). Di helbestê de tê dîtin ku ji ber şikîna pîyê xwe gelek zehmetî kişandiye û ji Xwedê û ji şêxên terîqetê alîkarî xwestiye. Ev helbesta wî ya ku bi "Sersed semaʾê çaran" dest pê dike ji 24 çarîneyan pêk hatiye. Benda serî û ya dawî weha ne:

1. *Sersed sema'ê çaran*
*Da'im dike deweran*
*Çare dadan demeran*
*Teqdîra Rebbê deryan*

24. *Weqtê seher carî dikim*
*Cirm û xeta tev par dikim*
*Rewş û xopan îzhar dikim*
*Bêtir binal ya Rebb meded*

(Bişaroğlu, 2022: 306-309)

Helbesta wî ya ku bi "Beramzadê derê qesrê" dest pê dike ji 23 çarîneyan pêk hatiye. Benda serî û ya dawî weha ne:

1. *Beramzadê derê qesrê*
*Lillahul hemd û el-ehwal*
*……………. di îmamê*
*Bi serkêşî mu'ala kir*

23. *'E'urûnî be…. ullah*
*Ricaullah 'ibadullah*
*Ya Qutbellah ya Resulellah*
*Qelbê **Yasîn** tebarek kir*

(Bişaroğlu, 2022: 310-313)

Helbesta wî ya ku bi "Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê" dest pê dike ji 12 malikan pêk hatiye. Malika serî û ya dawî weha ne:

1. *Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê*
*Te çil rojan li min şewtand wekî daxê li ser darê*

12. *Gunehkar ew feqîr e lê bike îstîxfarê*

*Ay mirin çêtir e ji halê wî dilêm .....*
(Bişaroğlu, 2022: 313-314)

Herweha li gor Mela Kutbettin Uygar helbesteke şûxane jî bi bal Mela Yasîn ve hatiye nisbetkirin. Lê heta niha ev helbest bi temamî nehatiye bidestxistin. Du beytên ji vê helbestê ku di bîra Mela Kutbettin Uygar de mane weha ne:

*Erê Fatê belê Fatê*
*Qorik te hanî du qatê*

*Cerhê **Yasîn** li ser cerhê te be*
***Yasîn** bi qurbana qorika te be*
(K. Uygar, Hevdîtin, Nîsan 4, 2020)

Ji bilî van helbestan Mela Yasînê Alikî di nav menzûmeya xwe ya bi navê “Ġezwetu Huneyn”ê de jî cih daye xezeleke ku ji 9 malikan pêk hatiye. Ev xezel bi qalibê erûzê û bi kêşê Mefa‘îlun / Mefa‘îlun / Mefa‘îlun / Mefa‘îlunê hatiye nivîsîn. Malika serî û ya dawî ya xezelê weha ne:

1. *Eya **Yasîn** bibe hişyar tu ketî l’benda dunya’ê*
*Bi zewq û hem sefaya wê nebe hevalê dunya’ê*

9. *Wiha dunya ku bêkêr e ji xeyrê ‘ilm û Qur’anê*
***Yasîn** da’im bigir ‘ibret ji dest vê qehbe dunya’ê*
(Bişaroğlu, 2022: 247-248)

## 4. KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ Û TESEWÛFÎ

Mela Yasînê Alikî temenê xwe di nav atmosfereke ilmî û edebî de borandiye. Li gor Mela Nezif Katılmış û Kutbettin Yılmaz malbata Mela Yasîn û ya Feqe Reşîd demeke dirêj bi hev re mane. Feqe Reşîd berhemên edebî-dînî dane, ders dane feqe û talebeyan û Mela Yasîn jî li ba wî xwendiye (M. N. Katılmış & K. Yılmaz, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Ev yek jî bi me dide zanîn ku Mela Yasîn hêj di zarokatîya xwe de di nav derdoreke dînî û edebî de mezin bûye û ji vê derdorê fêde wergirtiye. Herweha li gor malumatên kesên navborî; bavê Mela Yasîn û birayên wî jî kesên xwende bûne û melatî kirine. Li gor keça Mela Yasîn, Husna Atasevenê; Mela Yasîn zimanên weke Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî dizanîbûye û gelek berhemên bavê wê hebûne (H. Ataseven, Hevdîtin, Hezîran 28, 2021). Lê heta niha bi awayê nivîskî me tenê berhema wî ya bi navê “Ġezwetu Huneyn”ê bi dest xistiye û bi tevahî em gihaştin 5 helbestên wî.

Mela Yasînê Alikî di cengnameya xwe de zimanekî sade û herikbar bi kar anîye û di vegotin û riwayetkirina bûyerên destanî de zêde mahir bûye. Gava berhem tê xwendin ew atmosfera şer li ber çavan zindî dibe; ji alîyekî ve ne‘reyên lehengan û ji alîyekî ve jî dengên şûr, mertal û gurzan tên bihîstin. Mela Yasîn di metnên menzûm ên ceng û lehengîyê de xwedî pênûseke serkeftî ye.

*Ellah Ellah gotin*
*Wan sed nere-şêran*
*Xûn j' kafiran rêtin*
*Weke tavê baran*

*Şinge-şingê şûran*
*Tijî bû dunya'ê*
*Gujje-gujê tîran*
*Ji heddê qet na'ê*

*Rimmê di rimbazan*
*Ciger qul dikirin*
*Bi derbê çomaxan*
*Serî hûr dikirin*
(Bişaroğlu, 2022: 253)

Dema em li jîyan û helbestên wî mêze dikin tê dîtin ku şexsîyeta wî ya dînî-tesewûfî û edebî li pêş e. Mela Yasîn şexsekî ku di bin çanda medreseyan de perwerde bûye û mala xwe jî weke medrese bi kar anîye û ders dane feqîyan. Li gor malûmatên İsmail Çetin dane em dibînin ku Mela Yasîn ji Şêx Nesîmê Kufrewî û ji Muhemmed Hafidê Erwasî ilmê tesewûfê wergirtiye (Çetin, 2020: 40). Lêbelê malbata Mela Yasînê Alikî hay ji şêxîtîya wî tunebûye ango li gor malbatê Mela Yasîn şêxîtî nekiriye.

Em di helbestên wî de rastî şopên wî yên tesewûfî jî tên. Mela Yasîn di hin helbestên xwe de alîkarî ji şêxên Neqşebendî xwestiye û bawerîya xwe bi wan anîye. Gava em li helbestên wî dinihêrin tê dîtin ku li ser mijarên weke terîq, tesewûf, murşîdên terîqetê, pêxember, Xweda û qudreta Xwedê hatine rawestîn.

9. *Meded ya **Şahê Bexda'ê***
*Pê min bi ser hev da na'ê*
*Nalîn li min têne rayê*
*Tebîbê derdan el-meded*

10. *Meded ya **Xews** birîndar im*
*Qiyam li min bûye fu'ûd*
*Min dî eyn wek şaxek dar im*
*Me j' bîr nekî Rebbê sucûd*[34]
(Bişaroğlu, 2022: 307)

21. *Tu yî Seyîd wekî **Taha***
*Bi nisbet **Xewsê Hîzanê***
*Bi neytê nisbeta Seyda*
*Li etrafan 'elem rakir*

22. *Mucedded wekî **Fethullah***
*Bi rewneq wek **Zîyauddîn***
*Bi nisbet **Şahê Xiznayê***
*Ew nisbeta temam top kir*

23. *'E'urûnî be……**ullah***
***Ricaullah 'ibadullah***

[34] Ji ber nezelalbûna dengên di qasetê de hin peyv û bêje tam nehatin fêhmkirin û dibe ku xeletî tê de hebin.

*Ya* ***Qutbellah*** *ya* ***Resulellah***
*Qelbê* ***Yasîn*** *tebarek kir*
(Bişaroğlu, 2022: 313)

### 4.1. Edîbên ku Tesîr li Mela Yasînê Alikî Kirine

Dema em li berhem û helbestên wî dinihêrin tê dîtin ku tesîra hin helbestvanan li ser wî xuya dibin. Li gor daneyan em dikarin bibêjin ku Mela Yasînê Alikî di jîyana xwe de di bin tesîra kesên weke; Feqe Reşîdê Alikî, Muhemmed Efendî (s.s. 15.) û Melayê Senceqî de maye.

Me berîya niha jî anîbû ziman Mela Yasînê Alikî û Feqe Reşîdê Alikî xizmên hev in û Mela Yasîn li ber destê Feqe Reşîd ders wergirtiye. Gava em li berhema Mela Yasînê Alikî ya bi navê "Ġezwetu Huneyn"ê mêze dikin tê dîtin ku tesîra "Sirru'l Mehşer"a Feqe Reşîdê Alikî li ser wî maye. Hin nimûneyên vê tesîrê weha ne:

**Ji "Sirru'l Mehşer"a Feqe Reşîdê Alikî**
*Fîlhalî me da ewan cewab e*
*Ev teklîf ji bo me ra sewab e*
(Reşîd, 2020: 29)

**Ji "Ġezwetu Huneyn"a Mela Yasînê Alikî**

*Wana* ***da wî cewab e***
***Ev teklîfa sewab e***
*Qurban be da û bab e*
*Rûhê me tev fida be*
(Bişaroğlu, 2022: 229)

**Ji "Sirru'l Mehşer"a Feqe Reşîdê Alikî**

*Kanê Adem kanê Îdrîs kanê 'ilm û kanê tedrîs*
*Kanê cin û can kanê Îblîs kanê hem ew Semûd û 'Ad*

*Kanê Harût û digel Marût kanê Talût û hem Calût*
*Wergirtin efkan û tabut di 'erdê da niha ecsad*

...

*Kanê Yûsuf Zuleyxa hem Qubad û Keyqubad û Cem*
*Kanê Keyxusrew û Rostem kanê Şîrîn û kanê Ferhad*

...

*Kanê ew Nebîyê Serwer Ebûbekir kanê 'Omer*
*Kanê 'Osman kanê Heyder ku Ew bû hasilê îcad*
(Reşîd, 2020: 62)

**Ji "Ġezwetu Huneyn"a Mela Yasînê Alikî**

*Kanê 'Ebbas Ibnî Mirdas*
*Kan Zubeyr Ibnî 'Ewwam*
*Kanê Qeys û Se'dê Weqqas*
*Ev mirin cumle temam*

*Kanê ew Muxdad û Xalid*
*Kan 'Emmar Sufyan kiram*
*Kanê ew pişt û penahê*
*'Eskerê te xas û 'am*

*Kanê ew şêrê şikarî*
*'Elî Heyder ew bi nam*
*Ew kî ye were ku îro*
*Ez bikim ew î zimam*

(Bişaroğlu, 2022: 277-278)

Berhema Mela Yasîn "Ġezwetu Huneyn" berhemeke li ser ceng û lehengîyê ye û tê de behsa şerê Huneynê tê kirin ku ev şer di serdema Hz. Muhemmed (s.x.l.) de qewimîye. Cenga Huneynê yek ji wan herban e ku di Qur'anê de behsa wê tê kirin. Ev herb weke herba Huneynê, Hewazînê û Ewtasê jî hatiye binavkirin (Şulul, 2015: 572). Ev herb di 8ê hicreta pêxember de di meha Şewwalê (27 Kanûna Paşîn a sala 630î) de li gelîyê Huneynê qewimîye. Navê herba Huneynê ji vî gelîyî tê (Duisenov, 2011: 11). Gelîyê Huneynê li alîyê rojhilatê Mekkeyê ye û jê bi qasî 30 kîlometreyan dûr e, di navbera Mekke û Taîfê de ye (Şulul, 2015: 572). Di dawîya herba Huneynê de misilman bi ser dikevin û qebîleyên Seqîfûn û Hewazînê têk diçin (Apak, 2020: 379).

Di "Ġezwetu Huneyn"a Alikî de Hz. Elî di herba Huneynê de weke qehremanekî bêmîsal derdikeve hemberî me û li dijî mişrîkan bi wêrekîyeke mezin şer dike. Elî cengawerekî wisa ye ku di maweya herbê de kesekî miqabilê wî nayê dîtin û di hemû pevçûnan de bi ser dikeve. Di dema herbê de bîrîndar bibe jî ji cengawerîya xwe nayê xwarê û bi serfirazî li hemberî mişrîkan şerê xwe didomîne. Herçiqas berhemên di cûreya cengnameyê de li derdora cenabê pêxember hatibin nivîsîn jî Hz. Elî bi cengawerî û qehramanîya xwe bêtir derdikeve pêş.

Di lêkolînan de em rastî berhemeke Tirkî hatin ku ev berhem weke "Kıssa-ı Seyiddü'l-Murselin Huneyn Gâzası ve Şâh-ı Merdân'un Cengidür/Bu Kıssa Huneyn Gazasıdur ve Peygamberün Hevazin Begleriyle Ulu Cengidür" hatiye binavkirin. Dema em li ser vê berhemê hûr bûn hat dîtin ku "Ġezwetu Huneyn" ji gelek alîyan ve dişibe vê berhemê. Ev berhema navborî ku muelîfê wê Muhemmed Efendî ye (s.s.15) ji berhemeke el-Bekrî (s.s. 13.) ya bi Erebî ji bo Tirkî hatiye tercumekirin (Özfırat, 2019: 29). Ji ber ku me ya eslî ku bi Erebî ye bi dest nexist, em nizanin Mela Yasîn di bin tesîra kîjan berhemê de maye û berhema xwe telîf kiriye. Lê ji bo ku tesîr û şibandina van berheman bê dîtin ji cengnameya navborî ya Muhemmed Efendî û ji cengnameya Yasînê Alikî nimûne hatine dayîn.

**Tablo 4:Nimûneyên hevşibîna di navbera her du cengnameyan de**

| **Seyda Mela Yasînê Alikî** | **Muhemmed Efendî (s. 15)** |
|---|---|
| 50. Malik got ey 'Emra<br>Jin û zaran hev ra<br>Em biherin xo ra<br>Kes nereve j˙ pa ra | Pes dönüben 'Urveye didi ki biz<br>Bile gelsün 'avret oğlan mālumuz |

| | |
|---|---|
| 109.Tu bike beyan e<br>Çend ʿelemê wan e<br>Kincê wan çewa ne<br>Şef tên yan bela ne<br><br>125.ʿEbd got ya Mewlaʾê<br>Şexşek bû numaʾê<br>Nûrek birq vedaʾê<br>Ew nûr çû semaʾê<br><br>140. Hindek şubhê şêran<br>Dêlê ew hiltînin<br>Hindek şubhê maran<br>Xo lʾ hev dialînin<br><br>141. Hinek şubhê gurgan<br>Pencan lʾ hev dixînin<br>Hinek şubhê ṭeyran<br>Peran dihejînin<br><br>142. Hinek şubhê ḥûtan<br>Agir dibarînin<br>Dûman girtye deştan<br>Êdî em nemînin | Didi yā mewlāyī gördüm bir çeri<br>Niçe biñ irdi öñi yoḳ leşkeri<br><br>Didi şaygıl ḳaç ʻalem var yā ġulām<br>Her birinüñ rengini digil tamām<br>…<br>Kimi arslan kimi ḳaplan yılanlar<br>Kimi ḳurtdur kimi ayu hep anlar<br><br>Kimi ḳuşlar gibi uçar havāda<br>Gelürler ṭolṭolu olmış ovada |
| 205. We Muḥemmed<br>Cî da hişt paş da revîn<br>Me sekîne da Muhemmed<br>Hem ewan Yarê Guzîn<br><br>206. Hem melaʾik me şihandin<br>Bê ḥisab<br>Şûr li kafiran hejandin vekirin wan<br>Fetḥê bab | Yüz çevürüp ḳaçduñuz durmaduñuz<br>Ol Muḥammed ḥażretini ḳoduñuz<br><br>Biz sekīne virbidük tā Muṣṭafā<br>Durdı ol yārenler-ile ol ṣafā<br><br><br>Daḫı gökden virbidük biz leşkeri<br>Kim görinmez-idi size ol çeri<br><br>Yardım itdi size açdı fetḥ-i bāb<br>Ḳılıç-ıla kāfire ḳıldı ʿaẕāb |

| | |
|---|---|
| 231. Nagah hat ji wê da<br>Kurê Malik Enes<br>Birîndar xûnê da<br>Anceq dertê nefes<br><br>232. Pêġember suwal kir<br>Şahê Merdan kanê<br>Enes hikayet kir<br>Go bikim beyanê<br><br>233. Weqta ku bû nîvro<br>ʿElî hat bi ġar e<br>Ġayet germ e îro<br>Bînin ava sar e<br><br>234. Pêġemberê mêj ke<br>Jê ra bînin av e<br>Wî hilda yek meşk e<br>Em çûn gav bi gav e | Pes Resūlu'llāh didi kim yā Enes<br>Ḥāḳ saña çoḳ ḫayr virsün her nefes<br><br>Hīç bilür misin ʻamum oğlı ʻAlī<br>Hāli nedür ḳanda ola ol velī<br><br>Ya Resūlu'llāh bileydüm dir belī<br>Çünkim öyle ıssısı oldı ʻAlī<br><br>Baña didi bugün ıssı oldı gün<br>Şu gerekdür ol Resūlu'llāh içün<br><br>Tā kim içe hem daḫı āb-dest ala<br>Bir ṭulum götürdi pes varduḳ bile |
| 247. ʿEbas Xalid hem Zubeyr<br>Wana kafir qir kirin<br>Ḥeta gehane Ḥeyder<br>Wana kafir las kirin<br>Selam dike pêġember<br>Ji bo te intiẓar in<br><br>253. Wî dît cewşen parepar<br>Anîn ji [ser] derxistin<br>Heftê du birîn hejmar<br>Resûl ahên raḥiştin<br><br>254. Duʿa kir go ya ʿElî<br>Fexr dikin bi te melek<br>Nabin şubhê te welî<br>Teʿeccub bûye felek<br>(Bişaroğlu, 2022: 217-289) | Ḫālid u ʻAbbās Zübeyr ibn-i ʻAvām<br>Gördiler kim yaluñuz cengde imām<br>…<br>Gördi Peyġāmber dökilmiş cevşeni<br>Ḳara ḳanlarla yapışmış ḳaftanı<br><br>…<br>Gevdesinde yitmiş iki yarası<br>Var ḳılıçdan oḳdan açuḳ arası<br>…<br><br>Ki faḫr ider senüñ-ile melekler<br>Ŝebātuñda taʻaccübde felekler<br>(Özfırat, 2019: 1321-1387). |

Helbesta Mela Yasîn ku bi "Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê" dest pê dike ji bo helbesteke Melayê Senceqî (?) şopa nezîreyeke di xwe de vedihewîne. Senceqî helbesta xwe li ser medh û pesnê Şêx Elaeddînê Xeznewî nivîsîye. Helbesta wî ji şeş bendan pêk tê û bi teşeya "Terkîbbenda Muselles Digel Navbenda Dumisra" hatiye hûnandin. Bendên serî û dawî weha ne:

**Melayê Senceqî**

1. *Ela ey dilbera nazik hebîba ber dilê xorta*
*Te cism û can hemî sotin bi van daxan bi ser sota*
*Bi qurbana te bin sed heb wekî Zîna li nav Bota*

*Çira naête insafê ela ey serwerê dilber*
*Te ʻalem tev ji hiş xistin kirin dîn û esîr û zer*
…
6. *Di piştî vê şeva tarî gelo rojê bibînim ez*
*Ji axa ber piyê dilber gelo çav kil dikim pê ez*
*Hezar caran şukir îro şeker-xendê vexwendim ez*

*Me zanî* ***Senceqî*** *can da ji bo vê mujdeya dilber*
*Hezar wek* ***Senceqî*** *îro bi qurbana te ser-leşker*
(Koxî, 2004: 401-402)

**Mela Yasînê Alikî**

1. *Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê*
*Te çil rojan li min şewtand wekî daxê li ser darê*

…

12. *Gunehkar ew feqîr e lê bike îstîxfarê*
*Ay mirin çêtir e ji halê wî dilêm …ê*

(Bişaroğlu, 2022: 313-314)

## Encam

Mela Yasînê Alikî alim û edîbekî sedsala 20em e û heta niha nehatiye naskirin. Alikî hêj di zarokatîya xwe de di nav atmosfereke edebî û ilmî de mezin bûye û ji vê atmosferê sûd wergirtiye. Wî li ber destên çendîn alim û melayan xwendiye û xwedî perwerdeyeke ilmî û tesewûfî bûye. Herweha wî mala xwe weke medrese bi kar anîye û ders daye gelek kesan.

Malûmatên derheqê wî û berhemên wî de ne zêde ne, lê heta niha em gihaştin pênc helbest û berhema wî ya bi navê "Ġezwetu Huneyn"ê. Her çiqas li ser xwedîyê berhema "Ġezwetu Huneyn"ê di destpêkê de alozîyek hebe jî hemû dane û belgeyên li ber dest nîşan didin ku ev berhem a Mela Yasînê Alîkî ye.

Mela Yasîn berhema xwe ya navborî bi bendan nivîsîye û berhem li ser cengawerîya Hz. Elî ye (k.v.). Cengnameya Alikî di qada xwe de berhemeke girîng e, lewra bi taybetî di edebîyata Kurdîya Kurmancî de berhemên di cûreya cengnameyê de kêm têne ditin. Xasma ji alîyê mijarê ve berhema wî berhemeke xweser e, lewra di Kurmancî de li gor daneyan li ber dest li ser herba Huneynê ji bilî vê berhemê berhemeke menzûm û bi awayekî serbixwe heta niha nehatiye tesbîtkirin.

Mela Yasînê Alikî di cengnameya xwe de zimanekî sade û herikbar bi kar anîye û di riwayetkirina metnên destanî de jî gelekî mahir bûye. Cengnameya Alikî bi tevahî ji 373 bendan pêk hatiye. Berhem bi kêşa kiteyî hatiye nivîsîn, lê berhem ji serî heta dawî tenê ne bi kêşa kiteyekê bi çendîn kiteyên cûda hatiye nivîsîn. Herwiha di berhemê de xezeleke neh malikî cih digire û ev xezel jî bi kêşa erûzê hatiye hûnandin. "Ġezwetu Huneyn"a Mela Yasînê Alikî dê ji bo lêkolerên edebîyata Kurdî bibe daneyeke muhîm û herweha bi Mela Yasînê Alikî û berhemên wî dê lîteratura Kurdî dewlemendtir bibin.

**ÇAVKANÎ**

Adak, A. (2017). *Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*. *Kürt Tarihi Dergisi*. hej. 30. n.r. 59-64.

Apak, A. (2020). *Ana Hatlarıyla İslam Tarihi 1. Cild (Hz. Muhammed Dönemi).* İstanbul: Ensar Yayınaları.

Beşikçi, İ. (2014). *Doğu'da Değişim ve Yapısal Sorunlar Göçebe Alikan Aşireti.* İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı.

Bişaroğlu, S. (2022) *Cengnameyeke Hezretî Elî: "Ġezwetu Huneyn " a Mela Yasînê Alikî (Metin û Lêkolîn).* (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî). Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn.

Celîl, C. (2004). *Keşkula Kurmancî.* Wîen: Weşanên Doğa.

Çetin, A. M. (2020). *Şimdi: Hayatım, Hicretim Şeyh İsmail Çetin Hazretleri*. Isparta: Dilara Yayınları.

Çetin, İ. (2014). *Edeble Varış Lütüfla Dönüş*. Isparta: Dilara Yayınları.

Demir, A. (2012). *Qewlê Newala Sîsebanê.* Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Develioğlu, F. (2017). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*. Ankara: Aydın Yayınları.

Duisenov, N. (2011). *"Sebep ve Sonuçlarıyla Huneyn Gazvesi.* (Yayımlamamış Yüksek Lisans Tezi). Selçuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Ensititüsü İslam Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı İslam Tarihi Bilim Dalı. Konya.

Karak, M. Z. (2020). *Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*. (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî). Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn.

Kıran, İ. (2021). "Aristokrat Kürt Aileler: Kufreviler". *Kovara Kurdîyat*. hej. 4, n.r. 81-104.

Koxî, M. E. H. (2004). *Dîwana Cami'*. Diyarbakır: Weşanên Ihsan.

Mattei, J. L. (2004), *Hz. Ali Cenknâmelerî*. İstanbul: Kitabevi Yayınları.

Özfırat, B. (2019). *Sîretü'n-Nebi*. (Cilt 1). İstanbul: Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı.

Özfırat, B. (2019). *Sîretü'n-Nebi*. (Cilt 2). İstanbul: Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı.

Reşîd, F. (2020). *Sirru'l Mehşer*. (amd. Ahmet Gemi, M. Nezîf Katılmış).Wan: Weşanên Peywend.

Şulul, K. (2015). *Ana Hatlarıyla Siyer-i Nebî*. İstanbul: Ensar Yayinlari.

Tek, A. (2018). "Şeyh-Mürit İletişiminin Yazma Geleneğine Katkısı: Mela Zahirê Tendûrekî'nin Dîwan'ı", *Nüsha Dergisi, c 18. Hej. 47, n.r. 83-108.*

Yıldırım, K. (2018). *Kürt Medreseleri ve Âlimleri: Tekkelere Bağlı Medreseler.* Cilt. 2. İstanbul: Avesta Yayınları.


Arvas Ailesi Mensupları Sosyal Yardımlaşma Dayanışma ve Kültür Derneği. Seyyid Muhammed Hafid Arvasi, Dema gihandinê 28. 03. 2023) ( http://arvasidernegi.com/biyografi_detay.aspx?biyog_id=45 )

**HEVDÎTIN Û HEVPEYVÎN**

Akbaş, A. Mersin, (2021).
Ataseven, H. Patnos/Agirî, (2021).
Aytaç, A. Çanakkale/Biga, (2021).
Çelebi, A. Kocaeli (2021).
Erol, E. Mersin, (2021).
Katılmış, M. N. Patnos/Agirî, (2021).
Nas, Ö. (Seyda Mela Omerî Dudêrî yê Biçûk) Sêrt (2022).
Uygar, M. K. Patnos/Agirî (2021).
Yıldız, E. Kırşehir, (2021).
Yıldız, F. Kırşehir, (2021).
Yılmaz, K. Patnos/Agirî (2021).

## PÊVEK

**Pêvek 1: Fotografê Mela Yasîn û Mela Ebdulqudduseê kure wî.**




**Pêvek 2: Kêlên Mezelê Mela Yasînê Alikî.**




**Pêvek 3: Rûpelek ji Serî û Yek ji Dawîya Nusxeya Yusif Yaşar.**



**Pêvek 4: Rûpela serî û Temmeta Nusxeya Muhemmed Emîn.**





بسم الله الرحمن الرحيم


کر عفو کی یا غفار ⁂ رحما ئابت نقصان
صلواة بدن الی برا ⁂ هون خلاصی بن زیرانی
لمحمد اشکرا ⁂ شفیع روژا میرانی
هم دکلوی فاتحه ⁂ ژبو صحاب کرا
بازمانک فصیح ⁂ ژامت راتما

تاریخ النظم فی سنة ١٣٤٩ ناظمه شین بن عبد الله الالکی
کتبه محمد امین ابن خلیفه حاج ملا احمد
من عشیرت ملانی عروس سکانی قریة
فی هجری ١٢٧٩ شیوکار رحمة الله علی ابویه
وعلی کاتبه وعلیه آمین بحرمة سید المرسلین
الخط لباقی والجسد فانی
قد فرغ من کتابته محمد امین بن خلیفه
حجی ملا احمد بن زاده حسبة
لاستاده شین بن ملا
عبد الله الالکی الخالدی
النقشبندی

**Pêvek 5: Rûpela Serî û ya Dawî ya Nusxeya Mela Huseynê Botî.**


اول بسم الله ۞ الحمد لله ۞ لائق پادشاه ۞ بی مسکنی جاه ۞
نورا وحانه ۞ حنان منان رحیم رحمان ۞ غفور دنبات
غفور و غفار ۞ کبیر و ستار ۞ مدام نو هشیار ۞ خداوند مار
خداوند حور ۞ خداوند نور ۞ خداوند طور ۞ ژ کافران دور ۞
فردك ژ انسانان ۞ حبك ژ حیوانان ۞ جن کر ژ شیطان ۞
ملك ژ آسمانان ۞ حمو وی فتاین ۞ جاردن دسپارین ۞ لنامی
برهو بن ۞ محتاج خدا بن ۞ وی هر یه دیوان ۞ پاشی و ژ نامیبزان ۞
شابن باحسان ۞ لی اهل ایمان ۞ هرچی کو کفار ۞ بی دبیوا عذار ۞
مطلق اهل نار ۞ وی کار مطار ۞ ام تا ژ بیانکن ۞ نخفیا ژ عیانکن
بی دفعا غمان کن ۞ جماعت شاکن ۞ ژوی کر روایت ۞ بدلیل آیت ۞
[illegible] ۞ محمد مصطفی ۞ عسکر کر بهو [illegible] ار بیژ وفا ۞
دیتلن جور جفا ۞ ملکی دور کر ۞ علم لی ظهور کر ۞ پو [illegible]


قمت على شيطانه اللعنة وعلى كاتبه الرحمة

آمين يا رب العالمين

لا اله الا الله محمد رسول الله

**Pêvek 6: Agahîyên kutuka malbata Mela Yasînê Alikî.**



Alt-Üst Soy Bilgisi Sorgul...

Sıra: 1
ABDULLAH ÇELEBİ
Babasının Babasının Babasının Babası

| | |
|---|---|
| Adı | ABDULLAH |
| Soyadı | ÇELEBİ |
| Cinsiyet | E |
| Yakınlık Derecesi | Babasının Babasının Babasının Babası |
| Baba Adı | ALİ |
| Ana Adı | AYŞE |
| Doğum Yeri ve Tarihi | ERCİŞ - 01/07/1864 |
| İl | Ağrı |
| İlçe | Patnos |
| Mahalle / Köy | ÇUKURBAĞ KÖYÜ |
| Cilt No | 79 |
| Hane No | 6 |



Alt-Üst Soy Bilgisi Sorgul...

YASİN ÇELEBİ
Babasının Babasının Babası

| | |
|---|---|
| Adı | YASİN |
| Soyadı | ÇELEBİ |
| Cinsiyet | E |
| Yakınlık Derecesi | Babasının Babasının Babası |
| Baba Adı | ABDULLAH |
| Ana Adı | HEYAT |
| Doğum Yeri ve Tarihi | ERCİŞ - 01/07/1891 |
| İl | Ağrı |
| İlçe | Patnos |
| Mahalle / Köy | MERKEZ MAHALLESİ |
| Cilt No | 1 |
| Hane No | 208 |